

Fikra sendîkayê

Hemû sendîka dixebitin ku bi hev re cihê kar ber bi rewşeka baştir biguherin. Heger tu û hevkarên te wek komekê bi birêveberê karî re bidin û bistînin, şansa we ku hûn pêşniyazên xwe bidin qebûl kirin ji ku hûn yek bi yek bin bêtir e. Wezîfeya Kommunalê ew e ku piştgirîya we bike.

Lewra Kommunal - û sendîkayên din - hene

Wezîfeyeka girîng ya Kommunalê ew e ku meaşê te baş be siheta te li cihê te yê karî baş be. Mîmkin e tu ji midûrê xwe razî bî, lê ji bona baştirkirina şertên karî Kommunal piştgirîya te dike.

Kommunal alîkarîya te dike ku tu pirs û meseleyên xwe bi rê ve bibî

Tu bi alîkarîya Kommunalê dikarî bi hêsani zanînan derbarê qaîdeyên - bo nimûne - cedwela xwe ya karî yan tehtîla xwe peyda bikî. Wek din, em dikarin ji bo xebata te ya guherandinê piştgirek bin. Tu dixwazî di karê xwe de tesîrê li ser çî bikî? Tu û hevkarên te baştir cihê karê xwe nas dikin û ji bo tiştên ku dikarin baştir bibin xwedî pêşniyazên herî baş in. Hemû endam ji bo civînên endaman tîr vexwendin. Beşdarî civînan bibe û fikra xwe bêje!

Kommunal ji bo van tiştan dixebite

Kommunal dixebite ku her karî û her cihekê karî baştir bike. Divê kardarî û wezîfe ewle û emîn bin, jîngeha karî baş be, meaş adil be û her kesî heqê pêşdebirina pişeyî hebe. Hejmara di Kommunalê de çî qas zêde be, em ew qas dikarin tesîrê li ser pêşdebirinê bikin. Şertên karî yê baş ji bo endaman kalîteyeka bilindtir di refahiyetê de peyda dike û lewra ew ji bo gişan bazareka hêja ye.